Jibo dêbavên ku xizmetên bin piştevaniya malî ya IRCC behreyê werdigirin

TEVAHIYA ZANYARÎ Û AGAHIYÊN KU DIVÊ LI SER BERNAMEYA BALDARIYA JI ZAROKÊN TEZEHATÎ (CARE FOR NEWCOMER CHILDREN – CNC) BIZANÎ

Bi xêr hatî! Bernameya CNC bi awayekî taybetî hin zarokan e ku digel malbata xwe hatine Kanadayê û ji xizmetên ku bin piştevaniya malî ya IRCCyê ne, behreyê werdigirin. Em dixwazin alîkariya te bikin.

Em dizanin ku dema niha heyameka guhertinê bo te û malbata te ye. Armanca me ev e ku hevdem digel bicihbûna te li Kanadayê, em ê alîkariya te bona geşepêdana reftarî û xurtkirina pêbaweriyê li zarokê te bikin da ku hesta kêfxweşî, ewlehî û parastinê bike.

DEMA KU ZAROKEK LI NAV BERNAMEYA CNCYÊ YE, DÊBAV DIVÊ KU DI TEVAHIYA DEMÊ DA LI ŞÛNÊ AMADE BIN.

Tu tiştek ji ewlehiya zarokê te girîngtir nîne!

Bila xeyala te rihet be, ji ber ku kedkarên me xwedan merc û bi ezmûn in.

- Tevahiya kedkarên me xwedan berbihuriya çê û baş in û perwerdehiyên seretayî derbas kirine.
- Em sozdarê pêwîstiyên CNCyê ne û di bin çavdêriyê da ne da ku dilniyayî û piştrastbûn pêk were ku standardên tendurustî û ewlehiyê tên berçavgirtin.
- Jibo piştrastbûna ji vê yekê ku liv û tevgerên me derheq tevahiya zarokan yeksan û beranber e, em li gorî rêbaz û stratijiyekê tevdigerin. Kedkar pêwîst e ku ji riyên erênî liv û tevgeran xurt bikin. Tmbîhkirina fîzîkî an axaftina tund bi zarokan ra rêpêdayî nîne; Her wiha hêsankarî an kêmkirina sergêrî û çavdêriyê.
- Kedkaran erka xwe ya pêşeyî û soza qanûnî hene ku her rewşekê ku bûye sebeba azirandina zarok an her rewşa ku têda zarok ketiye ber hêsankarî û nebûna çavdêriyê, ji ber berpirsên têkildar ra bêjin.

Heke tu hez dikî li vî warî da zêdetirê bizanî dikarî kopiyek ji stratijiya reftarî an stratijiya gumana reftara neçê / hêsankariya derheq zarok ji me bixwazî.

Dikarî çi çaverêtiya te ji CNC hebe?

Renge şêwaza me jibo baldariya ji zarokan li atmosfêreka komkî li Kanadayê cihê digel welatê te be. Heke li bara şêwaza rêkûpêkbûn, xwarin, ziman, perwerdehî an babetên rûtîn û rojane yên me pirseka te heye, ji kerema xwe bipirse. Lêkolînîn nîşan didin ku zarok ji riya lîstinê va fêr dibin, lewma kedkarên me çalakiyêln fêrkirinê bi mijara lîstinê, fêrkirina li gorî meyl û eleqeyê, temen, şiyan û çand û debûresmên zarokan plan dadirijînin. Zarokê te têkilliya digel zarokên din fêr dibe û pisportî û hostetiyên amadebûna bo dibistanê li zarokê te geştir dibin.

Çawa tu dikarî ji zarokê xwe ra bibî alîkar da ku li gorî bernameya CNC saz bibe?

Ev tiştek xwezayî ye ku zarokê te di destpêka bernameya CNCyê da bitirse. Kedkarên me dê hevkariya te bikin ku ev qonax hêsantir bibe, lê di destpêka bernameyê da renge zarokê te bigirî, xwe ji te veneqetîne an liv û tevgerin din ji xwe nîşan bide. Bona agahbûna li ser vê yekê ku çawa dikarî tirsa zarokê xwe birijînî, pirtûka *Bi xêr hatî CNC'yê: Rênimûna dêbavan bona cidabûna hêdî hêdî bixwaze.*

Têkilliya di navbera dêbav û kedkaran girîng e!

Em bi xurtî şîret û pêşniyar dikin ku digel kedkarên CNC'ya me ra nasyar bî û agahiyên ku te li ser zarokê xwe heye, bi wan ra bêje. Dema ku em tevahî hevkariyê dikin, em baştir dikarin alîkariya zarokan bikin û bi ewlehî wan xweyî bikin.

Funded by: Immigration, Refugees and Citizenship Canada / Financé par : Immigration, Réfugiés et Citoyenneté Canada

Jibo dêbavên ku xizmetên bin piştevaniya malî ya IRCC behreyê werdigirin

TEVAHIYA ZANYARÎ Û AGAHIYÊN KU DIVÊ LI SER BERNAMEYA BALDARIYA JI ZAROKÊN TEZEHATÎ (CARE FOR NEWCOMER CHILDREN – CNC) BIZANÎ

Li van babetan teqez kedkaran agah bike:

- hestiyarî an sînordariyên xwarinê;
- nexweşiyên zarok an dermanên ku mesref dike (Ji kerema xwe balder be: Derman tenê di rewşên bi xeter ji hêla canî vat ê dayînê û nabe ku li ber destê zarok an li nav çenteyê wî/ê be ku bi xwe bi kar bîne;
- û hewcetî û kêşeyên taybet. Ewna renge bikarin beşdar bin!

Agahkirina kedkaran li van babetan jî renge sûdmend be:

- bernameya xewa kurtedem a rojane an xwarina zarokê;
- meyl û meraq û xwarinên hezkirî yên zarok;
- peyvên ku renge jibo têkillîdanîna bi zarok ra sûdmend bin;
- hin agahî li bara malbat û hevtemenên zarok li nav malê (An anîna wêneyeka malbatê);
- riyên taybet ku tu bona baldariya zarokê xwe bi kar tînî û tiştê ku renge ji CNC'yê bixwazî.

Tiştên din ku renge li bîra te bin:

- Jibo ewlehiya zarokê xwe, tenê kesek ji dêbavan ku bona xizmetan navê wî/ê hatiye nivîsîn, dikare zarokan bi xwe ra bîne an wan bi xwe ra bibe.
- Tu hertim divê ku di dema hatin û derketina zarokê xwe, lênivîsa hatûçûnê îmze bikî.
- Kincê ku zarok li ber xwe dike gere ku li gorî rewşa hewayê û çalakiyên ku dê li bernameyê pêk bîne, be. Heke li bara cûreya kincê ku divê zarok li ber xwe bike, pirseka te heye, ji kedkaran bipirse.
- Ev yek girîng e ku bi awayê rêkûpêk zarokê xwe bînî vê derê ta ku bernameya çalakiyên wî/ê yên hertimî bên parastin û bo dibistanê amade be. Heke zarok neçar be ku neyê navendê, ji kedkaran ra bêje.
- Heke zarokê te nexweş e, wî/ê neyne navendê da ku bi vî rengî rê li ber berbelavbûna nexweşiyê bê girtin. Zarokê ku Ta heye an tûşî vijik û îzhalê bûye, bila piştî 24 saetan ku tu cûre nîşane û dûhatên nexweşiyê lê nemane, bo CNC'yê bê anîn.

HER TIŞT LI SER BERNAMEYA ME YA CNC'YÊ

Navê perestaran: _____
Caregiver's Name / Nom du dispensateur de soins

Saetên CNC'yê: _____
CNC Hours / Heures de garde d'enfant

	Erê Yes / Oui	Na Non / Non
Ewlehkirin pêwîst e Immunization required / L'enfant doit avoir été vacciné	◯	◯
Em wadeyên xwarinê diidn zarokan We provide snacks / Nous fournissons des collations	◯	◯
Jibo navroj/ an xwarina navîn a zarokê xwe, madeyên xwarinê bi xwe ra bîne Bring food for your child's lunch/snack / Apportez le déjeuner/la collation de votre enfant	◯	◯
Di dema navrojxwarinê da, tu li ba zarokê xwe dimînî You care for your child at lunch / Vous prenez soin de votre enfant au déjeuner	◯	◯
Zarokan dema xwe ya razana rojane hene We have a naptime / Notre programme prévoit une sieste	◯	◯

	Erê Yes / Oui	Na Non / Non
Pêlîstokên hezkirî yên zarokê xwe bi xwe ra bîne Bring a comfort toy / Apportez un jouet réconfortant	◯	◯
Kincên zêde bo zarokê xwe bîne Bring extra clothes / Apportez des vêtements supplémentaires	◯	◯
Solên hundirîn bo zarokê xwe bîne Bring indoor shoes / Apporter des chaussures d'intérieur	◯	◯
Petû anku lihêfekê bîne (Heke pêwîst e) Bring a blanket (if needed) / Apportez une couverture (si nécessaire)	◯	◯
Pûşek û paçikên zarokê bîne (Heke pêwîst e) Bring diapers (if needed) / Apportez des couches (si nécessaire)	◯	◯

CMAS

ALÎKARIYA BO BALDARÎ Û BICIHBÛNA ZAROKÊN KOÇBER

Dêbav dikarin bona bidestxistina çavkaniyên agahiyên zêdetir serî li malpera www.cmascanada.ca

Care for Newcomer Children

Funded by: Immigration, Refugees and Citizenship Canada / Financé par : Immigration, Réfugiés et Citoyenneté Canada